PÊWÎSTE JINA KURD XWE JI FELSEFEYA "BINDESTÎ ÇARENÛS A MIN E" RIZAGAR BIKE

Ferha Yûsif

"Em jin darê şkestîne! Ma, çi ji destê me tê? Ji roja roj de, gotin ya zelamaye.", "Em qels in! Hêz hemû ya mêr e!", "Xwedê qedera me wisa nivîsiye.", "Ez nikarim bê bav û zelam û birayên xwe biryarekê bidim" û hwd. Jina kurd, roj nîne wek van gotinan di jiyana rojane de, neyîne ziman. Ji bęr ku ev dîtin bûye awir û nêrîneke jina kurd ji jiyanê re.

Lê, di rastiya pirsgirêka jinê de zelam e, dagirkerî û felsefa îdealîstî jin "heft qatan" kiriye bin erdê. Zilam bi xwe jî bindest e. Jin jî, ji du aliyan ve, vê bindestiyê dijî. Ji alikê ve bindestiya neyar û ji aliyekê din ve bindestiya zelam. Anku, jin di nava du agiran de, tê şewitandin. Sedemên vê yekê: civakî, siyasî, aborî, felsefî û bandora dagîrkerên Kurdistanê ne.

Bi taybetî, bindestiya jina kurd di nava malbatê de, xweş diyare. Di hemû warê jiyanê de, bindestiya jinê di nav malbat de, derdikeve pêş. Hiş, vîn, hest û giyana wê bi zelamên malbatê ve girêdayî ye. Her çendî li herêma Kurdistanê gavnên giring ber bi azadiyê ve hatine avêtin jî, lê ev nabe bersiva rizgariya jinê.

Ji aliyekê din ve, jina kurd rizgariya xwe di sorkirina lêvan de, li xwe kirina cilan û xwe xemilandina bi zêran ve dibîne. Cilan li xwe bike, li gorî dilê xwe, xwe bixemilîne, xwe xweşik bike. Lê, biryara jiyana te kî dide? Tu di hişê xwe de çiqasî azadî? Heta kîjan pileyê tu nûneritiya xwe dikî? Tu tevlî hilberînê dibî? Ev pirs û bersivdayîna van pirsan rastiya jina kurd datîne ber çavên me.

Di dawiyê de, dixwazim bibêjim: Pêwîste jina kurd tekoşîneke bêhempa li dijî felsefeya "Bindestî qedera min e" bide. Û berê xwe bide rastiya jinê a destpêkê, xwedî li jiyana xwe derkeve û ew jî bibe xwedî hêza biryarê. Ji bo pêkanîna vê armanca pîroz jî, divê di her warî de xwe perwerde bike û perwerdeyê bo xwe, wek pêdiviya nan û av, bizanibe.